**ZANÎNGEHA KOBANIYÊ**
**Fakulteya Wêjeya Kurdî**
**Made: Wêjeya Klasîk (2)**
**Semîner: ( 3-4)**
**Amadekar : Aras Hiso**

---

"Nivîskarê ku hûn dixwînin, mîna ku hûn ji xwe re
Hevalekî dineqînin, wilo bineqînin"
**Wentwoeth Dilo**



## NAV, TAYBETMENDî Û JÎNAMEYA FEQIYÊ TEYRAN:

Fqiyê Teyran yek ji klasîkên kurd e û hemçerxê Melayê Cizîrî ye. Ew di sala 1590'î de li gundê "warezorê" yê ser bi Miksê ve ji dayîk dibe. Xwendina xwe ya olî li Miskê sergihayî dike û li gelek deverên kurdistanê pir digere, Ji ber ku ji îlm û perwerdehiyê pir hez dikir ku li Hîzan, Miks, Cizîr û Findikê perwerdehî dîtiye û medrese bi medrese digeriya û di van gerên xwe de bi teyran re suhbet û dostanî dikir lewra je re Feqiyê "gerok" jî gotine. Navê wî yê rasteqînî "Mihemed" e û Fegiyê Teyran jî nasnavê wî ye. Bi şanenava "Mîm û Hê" ku dibe sembola "Mihemedê Hekarî" an jî "Mîr Mihemed" helbest nivîsîne: Jê re digotin Fegiyê Teyran ji ber ku digotin wî zimanê Teyran Fêm dikir her wiha bi xwezayê re nav li hev kirin û dostaniyeke xurt de bû û ev her du taybetmendî jî ji helbestên wî diyarin, nemaze helbesta "Bilbilê sewda û Ey avê av". Feqiyê Teyran zimanê gel di helbestên xwe de bi kar dianî, lewra ew bêtir nězi gel bú û hin serpêhatiyên wi ji hene. Li Cizîrê li ber destê Melayê Cizîrî feqîtî kiriye. Hesbestên wî ji aliyê gel ve pir hatine hezkirin û jiberkirin, ev jî bûye sedema nemirin û di hin cihan de lêzedekirina helbestê wî.

Feqiyê Teyran di sala 1590'î de hatiye dinê û 1660' de ji di 70'î saliya xwe de çûye li ser dilovaniya Xweda û li gundê Miksê Werezûzê hatiye veşartin. Feqî gelek caran di helbestên xwe de dîroka dema jiyana xwe diyar dike. Çawa di vê çarina jêrê de dibêje ez 70'î salî me û dîrok jî 1041'ê koçî (hicrî) ye.

*Mîm û Hê heftê felek çûn*
*Ji hicranê dewrn gelek çûn*
*Sal hezar û çil yek çûn*

Feqiye Teyran ji bilî helbestkariya xwe xwedî mîtoseke di nav civaka kurdan de. Di sala 1660'i de çûye ser dilovaniya xwedê.

**MÎTOSÊN (EFSANEYÊN) Lİ SER FEQİYÊ TEYRAN DERKETİNE:**

Feqiyê Teyran, ji bilî wêjekariya xwe di heman demê de di nav gelê kurd de mitosek e jî, ji ber rewşa wî ya mîtosî, kurdan carinan tiştên bedew û bilind ên ku ne ayîdî şexsê wî jî bûn ji ber hezkirinê etfî wî kirine. Lê kesayetek belasebeb wesfên mîtosî (efsaneyî) li xwe bar nake, ji ber ku Feqiyê Teyran bi hebûna xwe ji destpêkê de bi cewher û tevgerên mitik xemilandiye. Li xemilandina wî xeml zedetir bûne. Mitosên ku li ser hatine gotin bi kîmanî biqasî helbestên wî navdar û watedar in.

Hinek mîtosên ku di deheqê wî de hatine vegotin ev in:

-Mîtosa çêm
-Mêtosa Sêvê
-Mîtosa Çêm
-Mîtosa Teyr Zêran

**FÎLOZFÎ, ZANÎN Û HIZRA FEQİYÊ TEYRAN:**

Li gorî lêkolînên Akademîsyen û nivîskaran tê zanin ku Feqiyê Teyran Filozofekî mezin yê kurdên dema xwe ye. Feqiyê Teyran, di hizra xwe de xwediyê hizreke bi pergal e. Li gor civaka kurd ú kurdistanê dihizire û hizra xwe bi pergal dike û tîne ser ziman, Bi vê vekê re mirov dikare bêje ku bi wê hizrê xwe ya bi pergal re hizra pergala civaka kurdistanê jî tine ser ziman, Bi vê yekê re, divê ku mirov hinekî li ser hizra wî jî bisekine. Hizra Feqiyê Teyran mezin e.Hizreke ku rê nîşan didê. Feqiyê Teyran, Biqasî ku mirov ji berhemen wî yên ku mane ta roja me, mirov têdigihê ku ew di demê xwe de bi hizrê xwe de mazin e û di nav civaka kurdan de mezin e. Filozofên kurd, yên weke Elî Herîrî ku berî jîn bûne, her çend ku ji wan hinek hizir gihane deme wî û bandor li dema wî kiribin jî, lê dîsa divê ku mirov bêje ku ew mirovekî bêgotin ku dema xwe de awa daye.

**FEQÎ Û HEZKIRINA TEYRAN:**

Teyr difirin, teyr xweşk û bilind in, li ser avan datînin, dişêrin. li esmanên bêbend û sînor ji her tiştî bêhtir xwedê u stêrkan in. ji lewra feqî ji teyran hez kiriye û xwe bi wan re kiriye yek û navê wan li xwe kiriye. Feqî bi xwe ji teyîrkekî ezmanan û zemanan e.

Ji ber ku Feqiyê Teyran ji av û teyran hez kiriye ü ji ber ku şexekî "av"ê bûye, lewra Rênas Jiyan di pirtûka xwe ya Wejeya Kurmancî de Koleksiyoneke teyran jê re çêkiriye û koleksiyona wî ya teyran ji van teyran pêk tê:

**-Feqiyê Çivîk:** Feqî biqasî ku çivîkekî saf û bêguneh e, gava ku sêvekê di çemekê de dibine jî, bê destûra xwediyê wê naxwe, sêvê piştî riyek gelekî dûr û dirêj dibe dighine xwediyê wê. Tehde û zordariya wî ya li ser xweza û mirovan biqasî ya çivîkekî ye,

-**Feqiyê Baz**: Ew wek çivîkekî saf û bêguneh e, lệ li hember bêdadî û ne heqiyê bazek e ji. Pirî caran ew diçû ber avê per û baskên xwe wekî bazekî ji hev vedikir û bi çem û robaran re heta dawiyê şer kiriye. Li hemberî zilmê bazekî dijwar e. Hevalbendê kedê ye, nikil û lepûşkên wî ji şûrî tûjtir û sûtitir in, li ku kedxwariyekê bibine ji jor bi xezeb êrş dike ser wê.

**-Feqiyê Kew:** Feqiyê Teyran kewek e, kewekî dilketî ye; wek her kewî her tim ji ji mê-kewa xwe re xwendiye;

*"Ey Dilbera gerden zerî*

*Way nazika dêm qemerî*

*Qamet ji nûra fenerî*

*Ey Dilberê, way Dilberê*

*Feryad ji destê keserê*

*Avek ji ava kewserê"*

Feqiyê Teyran, ne bi tenê ji ber evîndariya xwe kew e, her wiha ew ji ber ahenga helbestên xwe jî kew e, ji ber ku ritma di helbestên wî de wek xwendina kewan tiştekî stranî ye.

*"Ey Dilbera gerden zerî*

*Way nazika dêm qemerî*

*Qamet ji nûra fenerî*

*Ey Dilberê, way Dilberê*

*Feryad ji destê keserê*

*Avek ji ava kewserê"*

Feqiyê Teyran, ne bi tenê ji ber evîndariya xwe kew e, her wiha ew ji ber ahenga helbestên xwe jî kew e, ji ber ku ritma di helbestên wî de wek xwendina kewan tiştekî stranî ye.

**-Fegiyê Quling:** Feqiyê Teyran qulingekî behra Wanê ye, diçû û dihat li ber malzaroka xwe !! behra xwe ya Wane vedigeriya û di wê malzaroka avî de distira. Fegiyê Teyran wek qulingan tim koçber û gerok e, av bi av geriya ye.

*"Hey qulingo xwe newestine,*

*Perr û baskan her hiline,*

*Here, ji tebî'etê ji min re giliyan bine,*

*îro li ser riyan ez rêwî me,*

*Tu li hewa xweş cibar be,*

*Ser gaz û gêdûka bilind xwar be*

*Hema ji derdê dilê min hişyar be.*

*Hey malxirab, tu guhdar ke,*

*Perr û baskan li min sî ke,*

*Min jî di gel xwe rêwî ke,*

*Çend giliyan li min safî ke."*

***-Fegiyê Hechecîk:*** Hechecîk wek teyr metaforiya xwe ya dinî heye, ji ber dindariya wî, Feqiyê Teyran hechecîkek e. Dîn, li gel rêgezên wî yên din ên wek "evîn û zanîn"ê rêgezeke bingehin e. Ew her tim dilsoz e, bawermendekî saxlem û pir mezin e, ewqasî ku pir îbadetê dike û dihere secdayê "enî" ya wî kul dibe.

"Dûr bû ji vê dinya denî

Pir digrî kêm dikenî

Kul bû ji ber secdê enî

DI kar û zewala axretê"

**-Fegiyê Qaqlibaz:** Feqiyê Teyran dîsa xwe wekî teyrê Qaqlîbaz ji dihesibine. Feqî wek qaqlibazan tu carî ji avê neqetiya ye û her li dora av, dar û berê xwezayê firiya ye

**-Fegiyê Albatros:** Albatros, teyrê behrê ye yê herî mezin in. Baudelaire albatosan wek Qralê ezmanan bi nav dike û helbestkaran jî bi wan re dike yek, "helbestkar wek mîrê ewran e, ji ber giraniya baskên xwe yên wek hûtan nikare bimeşe". Feqî teyr e, Feqî ev e; ji lewra Feqî helbestkarekî albatros yê gralê ezmanan e.

**ÇEND HELBEST:**

Helbestên Fegiyê Teyran gelek sade, rehet û pak e.Ew pir xweş zimanê gel, hunerê û wêjeyê Xistiye nav hev. Naveroka helbestên wî jî gelek berfireh in. Bi taybetî derbarê mijarên civakî û dirokî de nivisandiye. Di warê olî, pesnê Xweda û Pêxemberê wî û warê Bawerî ye de helbestan nivisandiye. Feqî hozanê Evînê ye. Li cem wî evîna mecazî û Rastî yek in, tevlihev in. Feqiyê Teyran hemdemê Melayê Ciziîrî ye. Wek ji alî gel tê zanîn Mela ne Mamostê wî ye, hevalê hev in.

**1-Çarinek- Bizan ku min yar tu yî**

*Bizan ku min yar tu yî*

*Ez kuştim yekcar tu yî*

*Bê dest û heparî tu yî*

*Ê bi xezeb xwendî ez im*

*Zencîr bi zencîrê ez im*

*Aşqê cindî ez im*

*Dil jî birîndar tu yî*

*Cama piyala tu yî*

*Delala mala tu yî*

*Nimeta ala tu yî*

*Yar di xeyalê ez im*

*Bi girt û berdan tu yî*

*(Feqiyê Teyran Bizan min yar tu yî )*

## *2-AY DILÊ MIN AY DILO*

*Dil ji min naket xeyalan*
*Bûme perwana şemalan*
*Bêriya husn û cemalan*
*Ay dilê min ay dilo*

*Can ferît im te nabînim*
*Deftera işqê bixwînim*
*Serxweş û sukran û dîn im*
*Ay dilê min ay dilo*

*Serxweş û sukran û mest im*
*Efa'lê eswed digestim*
*Sebr û aram çûn ji destim*
*Ay dilê min ay dilo*

*Sebr û aram û sikon e*
*Baziyê nav lê 'uyon e*
*Dil ji pencan kirbû xwon e*
*Ay dilê min ay dilo*

*Bazê me krî sikince*
*Girtibû ez bi her du pence*
*Min mûdan dil jê bi renc e*
*Ay dilê min ay dilo*

*Hêstirim barîn ji xwînê*
*Sotim ez derdê evîne*
*Kes ji min neket yeqînê*
*Ay dilê min ay dilo*

*Dax û kovan bê hesab in*
*Mihnet û eyş û ezab in*
*Xem ji qelbê min venabin*
*Ay dilê min ay dilo*

*Van deman yek carî xwarim*
*Dîn kirim dîne bi har im*
*Agirê işqê bijarim*
*Ay dilê min ay dilo*

*Agirê işqê û pêt e*
*Her kesê dê kes navête*
*Demekî naket tebête*
*Ay dilê min ay dilo*

*Demekî naket qerar e*
*Eev û roj ahî û zar e*
*Ez xelas bûm bûme dar e*
*Ay dilê min ay dilo*

*Rey û tekbîrim xilas bûm*
*Zilfê çokan çep û rast bûn*
*Gelew kazin bê qiyas bûn*
*Ay dilê min ay dilo*

*Sîne ey hubê herişte*
*Bi agirê işqê birişte*
*Qet li min nayên nivişte*
*Ay dilê min ay dilo*

*Sîneya hubê sidûr e*
*Dax bi dil kovan û kûr e*
*Wan hemiyan dil ji nûr e*
*Ay dilê min ay dilo*

*Wan hemiyan agir di nav bit*
*Min ji daxan dil zirav bit*
*Bê hisab şîşe di nav bit*
*Ay dilê min ay dilo*

*Bê hisab şîş lê kişande*
*Hûr kiro misk lê reşande*
*Nezera zer şeh veşande*

*Ay dilê min ay dilo*

*Nezera sahib nezîra*
*Teşbîhê berqê di şîra*
*Dame ser gezmê di tîra*
*Ay dilê min ay dilo*

*Gezmeyan carek hinavan*
*Hûrtira ejnû û nûgavan*
*Tarûmar kirbûn ji gavan*
*Ay dilê min ay dilo*

*Tarûmar kir can û cism e*
*Pisyar in cîran û xizme*
*Ev xizmet babet tilisme*
*Ay dilê min ay dilo*

*Mîm û hê wesfê xwe hilda*
*Xweş mêsal in çûn di cilda*
*Cerh û kovan çûn di dil da*
*Ay dilê min ay dilo*

**BERHEMÊN FEQIYÊ TEYRAN:**

-"Ey Ave Av" (Helbest, Bexda 1989, amadekar Abadulregin Yûsif, Stenbol 1999, amadekar Seîd Dêreşî, ji ber về çapê M.Reşit Irgal û M.Ismet Kiliçstan.)

-"Şêxê Sen'anî" ( Helbest, Moskow 1965, amadekar Margharat B.Rudenko, Memo Yektin, Stenbol 1999, amadekar M.Reşid Irgal, Wiyana 2003, amadekar Celîlê Celîl.)

-"Bersîsê 'Abid" (Helbest, ji 422 bendan pēk tê, ji hêla Abdulreqib Yûsif ve di sala 1978'an de, di rojnameya "Hewkari ye de bi navê 'Destnivisa Feqiyê Teyran tê weşandin.)

-"Kela Dimdim" (Ev helbest ji hêla Celîle Celîl ve di 'Keşkûka Kurmancî de hatiye weşandin.)

-"Dîwan" (Helbest, Bexda, 1989, amadekar Seîdě Dēreşi, Duhok 2005.)

-"Qewlê Hespê Reş"

"Gulbihar" (Berhevkirina ji nav xelkê, berhevkar Aramê Çani, Eriwan 1957.) -Destana Zembilfiroş.

SPARTEK:

1-Navên Feqiyê Teyran ên ku bi hatine naskirin, bîne ziman.

2-Em di vê malika jêrîn de çi nas dikin.

Mîm û hê heftê felek çûn
Ji hîcranê dewran gelek çûn
Sal hezar û çil û yek çûn

3-Hinek mîtosên ku di derheqê Feqiyê Teyran de derketine, rêz bike.

4-Di derbarê feqî û hezkirina Teyran de li ser (Feqiyê Baz, Feqiyê Quling, Feqiyê Hechecîk) pênase bike.

5-Tu malikan ji helbestên Feqiyê Teyran veqetîne û şirove bike.

6-Navên çar berhemên Feqiyê Teyan bîne ziman.